**Serlêdan**

1. Hûn bi xêr hatin pirtûkxaneyê!

2. Bi serdana we, pirtûkxane wê kêyfxweş bibe. Di demên pirtûkxane vekiriye de hûn dikarin hemû weşanên li pirtûkxanê bi awayekî azad bi kar bînin.

3. Li pirtûkxaneya me hûn dikarin van weşanan bi deyn bistînin:
   - Pirtûk
   - Kovar
   - Pirtûkên bi tîpên girs
   - Qert
   - CD-ROM
   - Kaset
   - Compact Discs
   - Vidyo
   - DVD

4. Şertên sitendina bi deyn
   - Bi beramberiyeke salane ya.......... CHF hûn dikarin herî zêde ........... pirtûk/weşanan bi deyn bibin.
   - Birina bi deyn belaş e.
   - Ji bo zarok û ciwanên di bin ........ salî de birina bi deyn belaş e.
   - Birina bi deyn a pirtûkan belaş e.
   - Ji bo weşanên ne pirtûk in (Nonbooks) serê her salekê divê ....... CHF were dayîn
   - Ji bo weşanên ne pirtûk in (Nonbooks) di her birina bi deyn de divê ...... CHF were dayîn.

4.1 Gava hûn bixwazin pirtûkekê/weşanekê sîparîş bidin divê hûn ......... CHF bidin. Çawa ku pirtûk/weşana we bigihêje ber destê me, hûnê werin agahdarkirin.

4.2. Ji bo serlêdanê ku em karibin qeyda we çêbikin, pêwîstî bi nasnameyeke bi wêne a fermî heye.

4.3 Ji bo zarok û ciwanan pirtûkxane pêwîstiyê bi destxeta dayik/bav dibîne.

4.4 Ji kerema xwe re pirtûk/weşanên hûn dibin bi baldarî bi kar bînin. Di rewşa windakirin an xisardayînê de pirtûkxane wê ji we berdêla wê bixwaze.

5. Paşdedayîn

5.1 Heta dîroka hatiye diyarkirin hûn dikarin pirtûk/weşanê li cem xwe bigrin.

5.2 Hûn dikarin pirtûk/weşanan çar hefteyan li cem xwe bigrin.

5.3 Hûn dikarin pirtûkan çar hefteyan, weşanên din .... hefteyan li cem xwe bigrin.

5.4 Ji kerema xwe re pirtûk/weşanên we birine di dema hatiye diyarkirin de, paş de bînin  ango dîroka dayînê bidin dirêjkirin, wekî din wê pirtûkxane heqê derengmayînê ji we bixwaze.

6. Em hêvîdar in ku ev pêşniyazên me li xweşiya we çûne! Û ger hûn di derbarê me de derdor û hevalên xwe ango komeleyên hûn dinasin agahdar bikin, emê kêyfxweş bibin..

7. Bi serdana we, emê kêyfxweş bibin!

**Destûra dayik û bav a ji bo serdana pirtûkxaneyê**

1. Zarokên we dixwazin ji pirtûkxaneya me pirtûk/weşanan bi deyn bibin. Ji bo vê pêwîstiya me bi destûrdana we heye.

2. Ji pirtûkxaneyê birina bi deyn a pirtûk/weşanan ji bo zarokên di bin ........ salî re bi gelemperî belaş e.
   Ger zarokên we pirtûk/weşanan dereng bînin, ji we re wê hişyarnameyek were şandin û divê em hinekî heqê wê bistînin. Ji kerema xwe re li ser rawestin ku zarokên we pirtûkên birine bi baldarî bi kar bînin. Ger xisarê bidin pirtûk/weşanan, divê pirtûkxane heqê xisardayînê ji we bixwaze.

3. Ji kerema xwe re vê qertê dagrin, destxweta xwe lê xêz bikin û ji bo gava were pirtûkxaneyê radestî me bike, bidin zaroka/zarokê xwe..

Bi pêşwazîkirina we ya li pirtûkxaneya xwe jî, emê kêyfxweş bibin.!

Kurdisch-kurmancî-Übersetzung:Hesen Huseyîn Denîz